



Bundesministerium
für Gesundheit

**Ethno-
Medizinisches
Zentrum e.V.**



Şîretdara Tendurustiyê

Ji bo daxwazkerên penaberiye li Elmaniya

Impressum *Navnîşan û mirov ên t êkildar*

Herausgeber *Derhêner:*

Bundesministerium für Gesundheit *Wezareta yekgirtina Elmaniya bo kar û barê Tendurustiyê*

Task Force Migration und Gesundheit

Referat Z 24 „Migration, Integration, Demografie und Gesundheit“

Yekîniya hêzê penaberî û tendurustî

Beşê Z 24 “Penaberî, Pêkvejiyan, Demografi û Tendurust”

11055 Berlin

www.bundesgesundheitsministerium.de

Gestaltung *Şêwepêj:*

eindruck.net

Rêxistina Navenda Tendurustiya regezan (EMZ e.V.)

Titelfoto *Wêneyê Navnîşan:* © Bundesministerium für Gesundheit

Druck *Çapxane:* unidruck.de

Stand *Dema çapê:* Juni 2016 (3. Auflage) *Hezêran 2016 (Çapa 3)*

Auf der Internetseite des Bundesministeriums für Gesundheit unter www.bundesgesundheitsministerium.de/Fluechtlinge-und-Gesundheit steht diese Publikation in den Sprachversionen Englisch, Arabisch, Paschto, Kurdisch-Kurmanci, Farsi und Dari als PDF zum Download zur Verfügung. Sie können diese Publikation in allen Sprachversionen auch als gedrucktes Exemplar über die folgenden Bezugsquellen anfordern:

Li ser malpera Internet ê ya wezarta Elmanî ya Tendurustiyê di bin www.bundesgesundheitsministerium.de/Fluechtlinge-und-Gesundheit ev berhevok bi ziman ên Engilîzî, erebî, paştô, kurdî-kurmancî, farisî û darî wek PDF heye. Hun dikarin vê berhovekê bi hemî zimanên me nivîsî wek yeke çapkirî ji van jêder û rêxistin ên jêr bixwazi:

Xwestin a online: www.Ratgeber-Gesundheit-fuer-Asylsuchende.de

E-Mail: bestellportal@ethnomed.com

Schriftlich *Adrês:*

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V. · Königstraße 6, 30175 Hannover

Naverok

| | |
|--|-----------|
| 1. Agahiyên giştî ji bo tendurustiyê..... | 3 |
| Katjimêra axaftinê di gel saziyên wergirtinê | 4 |
| Belgeya dermankirinê û kerta elektronîk ya tendurustiyê..... | 4 |
| Rêxistinên alikariyê | 5 |
| Bijîşkên xudan iyade..... | 6 |
| Nexweşxane..... | 7 |
| Rewşên hawarhatinê | 7 |
| Dermanxane | 8 |
| Pişkinîna yekem..... | 10 |
| Vakslêdan | 11 |
| Ducanî | 12 |
| Zarok û ciwanên temenê ta bi 18 salî | 12 |
| Dermankirina diranan..... | 13 |
| 2. Agahiyên pratîk bo parastina ji nexweşiyên û vegirtinê | 14 |
| Destşuştina bi hurgilî û berdewam..... | 14 |
| Kuxik û pişkinandin | 16 |
| Hay ji nîşana yekem hebe..... | 17 |
| Pêvek 1: Pişkinîn (fehes) | 18 |
| Pêvek 2: Formulera cihgir bo belgeyên vakslêdanê | 19 |

1. Agahiyên giştî ji bo tendurustiyê

Li Elmaniya serederiya guhpêdana tendurustiyê di gel sîgorta nexweşiyê bend e. Eger li Elmaniya tu daxwaza penaberiyê bikî, ji destpêkê ve bo tendurustiyê, tu nesîgortakirî yî. Ji ber wê jî saziyên fermî berpîrsê tendurustiya te ne. Bo nimûne saziya civakî (Sozialamt) an jî saziya tendurustiyê (Gesundheitsamt) dibin hilgirê barê te bo dermankirinê li gel bijîşkekî an jî bijîşkekê, bijîşkê/a diranan û her weha bo vaxlêdanên parastinê û pişkîniyên bo tendurustiyê pêdivî)

Saziyên fermî bi hemî saziyên din yê tendurustiyê pêk ve kar dikin.

Hûn dikarin ji hêla bijîşkekî/ê ve bête dermankirin, dema

- Hûn bilez nexweş bikevin
- Eger êş zor hebe
- Eger ducan bî

Zarok, dayik ên nû, qurbanên îşkencê û tundûtûjiyê û mirov ên xudan daxwazên taybet, ew mirov in yê taybet pêdivî parastinê ne. Daxwazên tendurustî yê van mirovan bi taybet li ber çav tene dîtin.

Giring e:

Ji kerema xwe hemî belegeyên pişkinînan yê we stendî baş biparêzin! Bo nimûne, belgeya vaxlêdanê (Impfausweis) û ya jidayikbûnê (Mutterpass). Di van belgeyan de, gelek agahiyên giring û pêdivî hene, di demên bînan de, dikarin di seredanên bijîşk an jî nexweşxaneyan de zor giring bin.

Katjimêra axaftinê di gel saziyên wergirtinê

Di hinek eyaletên Elmanî de, bijîşk rasterast katjimêrên axaftinê di hundurê saziyên de dikin. Li wan saziyan guhpêdana tendurustî li cihê ew lê, wate li kampan li gor katjimêrên axaftinê bi rê ve diçin

Belgeya dermankirinê û kerta elektronîk ya tendurustiyê

Li gor her eyaletekê li Elmaniya, hûn ê belgeya dermankirinê (Behandlungsschein) an jî kerta elektronîk ya tendurustiyê (Gesundheitskarte) werbigirin.

Belgeya dermankirinê, bi giştî jî bo demeke kurt e. Hûn wê belgeya dermankirinê jî saziyên fermî werdigirin bo nimûne, jî saziya civakî (Sozialamt), eger hun nexweş bin. Pêdiviyê ewe belgeya dermankirinê bo iyadeya bijîşkî/ê bête danê. Eger hat û bijîşk/ê derman bo te binivîse, an jî te rêke nexweşxaneyekê, pêdiviyê beriya çûna te, ew saziya fermî bipejirîne û destûrê bide.

Li hinek eyaletên Elmaniya, penaber jî saziyên fermî an jî sîgorta nexweşiyê, kertên elektronîk yê tendurustiyê (Gesundheitskarte) werdigirin

Kerta elektronîk ya tendurustiyê cihê belgeya deramnkirinê digire. Bi wê hûn bixwe dikarin bijîşkê/a bo xwe rasterast hilbijêrin, bêyî ku hun pêdivî bi anîna belgeya dermankirinê jî saziyên fermî hebin (Saziyên fermî wek, saziya civakî). Pêdiviyê hûn kerta elektronîk ya tendurustiyê baş biparêzin.

Kerta elektronîk ya tendurustiyê

Rûyê pêş

Logo ye, weke hev li ser kerta saziyê wek nîşaneke nasinê ye

Hesinekî tenik ya bi erkê şefrekirinê radibe

Agahiyên li dor xudanê kertê (nav, nemreya sigortekirinê)

Cihê Logo yê kerta sigorta

Nîşana weke hev li ser kerta saziyê wek nîşaneke nasinê

Wêneyê mirovê sigortakirî

Nîşana wek „Kerta elektronîk ya tendurustiyê“ bi nivîseke nepenî (bidîlxwazî)

© Bundesministerium für Gesundheit

Navnîşana saziya elaqedar ya dewletê

(Bitte Eintragung durch jeweilige Aufnahmeeinrichtung)

Rêxistinên alikariyê

Dezgeha wergirtinê ji dikare navê rêxistinên alikariyê (Xaça Sor, Diyakonî, Karîtas, Malteser û gelek rêxistinên din) bide, yên xizmetguzariya tendurustî pêşkêş dikin. Agahiya ji xwe re werbigire, ka ew saziya wergirtinê ya hûn tê de alikariyên nojdariyê pêşkêş dike an jî nîşanî te bike.

Bijîşkên xudan iyade

Destnîşankirin û di dawiyê de dermankirin nexweşiyê, barê bijîşkan e, yên bi xwe iyade hene an jî di iyadeyên hevbeş de ne, di gel komek hogirên, bijîşkên din kar dikin. Ji wan re dibêjin, ev bijîşkên jin û mêr yên „destûrdayî“ ne. Ev bijîşkê/a destûrdayî, dikare raçêtên ji bo dana dermanan bo te binivîse û her wisa dikarin nexweşên xwe veguhêze nexweşxaneyan eger pêdivî bibîne.

Bijîşkê an jî bijîşka destûrdayî yên iyadên wan hene, ji bo encama karên xwe, dikarin hesabê pereyên xwe bi saziya civakî (Sozialamt) an jî sîgorta nexweşiyê (Krankenkasse) ya fermî re bikin. Nexweş dikarin li nîk bijîşk buhayê deramkirinê rasterast pereyan bidin. Agahdar bin, ku êdî hun ê pereyên karê dermankirina bijîşkî bidin. Ew pereyên te dayî êdî nema li we vedigerin.

Giring e:

Hijmara mezin ji bijîşkan, bi xwe soz û civanan didin nexweşên xwe. Ji ber wê jî baştir e, civanekî xwe bi telefonê werbigire. Pêgiriye bi civanê te wergirtî bike! Ew nexweşxaneyên ku te dora xwe tê de qeyd nekiribe û civan wernegirtibe, dikarin gelekî te bendewar bikin.

Bijîşkên jin û mêr, pêdivî ye, pêgirî bi erkê nemukurhatinê bikin. Nabe ew agahiyên nexweşê xwe bidin hineke dinê. Hindek nexweşiyên ku tên vegirtin hene, mîna êşa zirav, pêdiviye, saziya tendurustiyê bêtin agahdarkirin. Tenê di vê rêkê re, ev nexweşiyên di rêka vegirtinê re berbelav dibin, dikarin bihêne rawestandin. Ev agahî kartêkirinê li pirsra penabertiyê nake.

Giring e:

hijmareke mezin ji wan bijîşkan bi zimanê ingilîzî an jî zimanekî din biyanî diaxivin. Di pey re agadariyan li ser vê yekê werbigirin. Eger hat û elmaniya we têrê nekir, dê baştir bibe, ku hun mirovekî pêbawer di gel xwe bibin nik bijîşkê/î

Nexweşxane

Tenê, hun dikarin li nexweşxanê (Krankenhaus) derman bibînin, eger ew bijîşkê/a derstûrdarî, diyar bike, ku dermankirina we li nik wî têrê nake. Mayina li nexweşxanê û dermankirin pêdiviyê pêşber bête pejirandin û destûr bête danê. Ji ber wê jî, tenê di demeke hawariyê de, berê xwe bidin nexweşxaneyan!

Rewşên hawarhatinê

Rewşên hawarhatina tendurustî (medizinische Notfälle) bo nimûne ev in:

- Bêhintengiyêke zor di henasê de,
- Êş û azareke bihêz di besta singê de,
- Zêkêşiyêke bihêz,
- Gêjbûneke zor,
- Qeza û birîndarî,
- Pirsgirêk di ducaniyê de,
- Têkçûnên derûnî yên lez,
- Tirsî ji xwekuştinê,
- Rewşa hawarhatinê ji bo demanên hoşbir,
- Metirsiya xwîntewrênekê,
- Jiserhoşçûyîn an jî Koma.

Di van rewşan de, pêdiviyê hûn yekser alîkariyê ji xizmetguzariya qurtalkirinê, cihêkî ahwarhatinê, an jî bijîşkekê/î bixwazin.

Li wir hûn dikarin di rewşên hawarhatinê de cihê alîkariyê bibînin:

Mirovê tu pê re têkildar bi bo rewşên tendurustiyê yên bihawarî di dezgeha wergirtinê de:

(Bitte Eintragung durch jeweilige Aufnahmeeinrichtung)

Dermanxane

Gelek derman hene li Elmaniya, tenê li dermanxaneyan (Apotheke), bo nexweşan têne danê. Hûn dikarin ji dermankerekî/ê hinek dermanên destnîşankirî werbigirin (wek tê gotin, derman „ku erk e bête nivîsîn“) tenê bigirin, dema hun raçêta bijîşkê/i bo nivîsî, nişanî dermanker bikin. Hijmareke mezin ji dermanan heye, ku têne firotin, ku pêdivî bi raçêtê nînin. Perê van rengan ji dermanan saziyên fermî bihayê wan li we venagerîne.

Yê dermanker, agahiyan li dor çawa tu derman bikar binî dibêje te.

Hemî rojan û bi şevan, bi kêmanî dermanxaneyek li nêzikî te heye, ku nobedar be.

Hûn dikarin awirekê bidin Raçêtê:

The image shows three overlapping medical forms. The top form is a patient data form with fields for name, address, and insurance. The middle form is a receipt for medical aid with a table for recording items. The bottom form is a doctor's prescription card for Dr. med. Alexander Medicus.

Form 1: Patient Data Form

Krankenkasse bzw. Ausländische
 Name, Vorname des Versicherten
 Geburtsdatum
 Geburtsort
 Familienname
 Versicherungs-Nr.
 Beruf
 Rp. (Bitte Versichertennummer)
 Leistungsbezugsgruppe

Form 2: Empfangsbestätigung für Hilfsmittel

| Nr. | Stückzahl | Überschrift des Empfängers |
|-----|-----------|----------------------------|
| 1 | | |
| 2 | | |
| 3 | | |

Form 3: Vermerke der Krankenkasse

Vermerk zur Anwendung (Rechtswert) abgeben, so hat der Patient eine entsprechende Vermerk (rechtlich) anliegt.

Form 4: Dr. med. Alexander Medicus

Dr. med. Alexander Medicus
 Arzt für Allgemeinmedizin
 Tel. (02234) 7011-0 · Fax (02234) 7011-470
 Dieselstr. 2
 50859 Köln (Lövenich)
 Sprechstunden: Mo – Fr, 9–11 u. 16–17 Uhr
 außer Mittwochvormittag und Samstag

Rp. den

© 2008 Dr. T. C. Göttsche / Deutscher Ärzte-Verlag, Düsseldorf, Köln, 50859 Köln

Pişkinîna yekem

Giring e:

Di rêka pişkinîna yekem (Erstuntersuchung) re pêdiviyê nexweşiyên vegirtinê bêne naskirin, û bihên dermankirin. Bi vî şêweyî dikare rê li ber belavbûna nexweşiyên vegirtinê de bête girtin.

Piştî hatina te li nav cihê wergirtinê „Kamp“ tu dê li ser destê bijîşkê/ê bête pişkinîn ji bo nexweşiyên vegirtinê û guhêzbar. Ev pişkinîna erkeki yasayî ye û divê mirov bike. Ji ber wê jî divê hun pişikadrî wan pişkinînan bibin! Dibe beriya fehsê hun pirsên formularekê (Formulara agahiyên li dor tendurustiyê) dagirin. Bijîşkê/î pirsan li dor nexweşiyên vegirtinê dikin û fehsê dikin.

Encama pişkinîna yekem kartêkirin li ser pirsê penabertiya te nîne!

Ji bo ku mirov bizanibe, aya êşa zirav heya an na, divê wêneyê tîjk („Röntgen“) ji kezebê re bête girtin. Li nik genc û zarokên di bin 15 salî re û li ba jinên ducanî ji dêvla ku ji wan re wêneyên tîjkan bigirin, serederiyeke din ya guncayî bo rewş û temenê wan, di gel wan dikin (bo nimûne: pişkinîna xwînê) cihê wêneyê tîjkan digire. Eger hat û hun bi ducanî bin, ji bijîşkê/ a xwe re bibêjin!

Di hinek eyaletên Elmanî de, hinek pişkinînan din zêdetir bi kar tînin. Xwînkişandin bi erkê aya vegirtinê heye an jî nîne, radibe. Pişkinîna destava mezin diyar dikin, aya virosên nexweşiyên zikçûnê û kurma hene an na.

Ji kerema xwe bihêle hemî pişkinînan, ku têne kirinê, bêne belgekirinê. Eger hate û we dosiya belgeyan wernegirtibe, hun dikarin wan pişkinînan, li ser destpêka pêveka 1 ji (rûpelê 18) bi belgekirin bikin.

Vakslêdan

Vakslêdan, mirovan ji kartêkirina li wan nexweşiyên, ku di rêka bakteriya û Virosa dibin, diparêze. Eger hat û hijmareke mezin ji mirovan, li dijî wan nexweşiyên vakslêdan bibin, êdî ew nexweşî di nav civatê de berbelav nabin.

Dibe ku her yek ji we, belgeya vakslêdanê ya wî hebe, ku tê de diyar dibe, ka çi rengê vakslêdan wergirtine. Eger we ew belgeya Vakslêdanê (Impfausweis) nebe, hunê belgeyekê „Pasa Vakslêdanê“ an ji belgeyekê ku cihê wê bigire, di pey Vakslêdanê ji nik bijîşk î.

Giring e:

Ji kerema bihêlin ku hun û zarokên we werin vakslêdan! Hûn, bi vakslêdan, xwe, malbata xwe û wan mirovên li derdora xwe ji nexweşiyên vegirtinê diparêzin. Di vê rewşê de, hûn rê li ber berbelavbûna nexweşiyên mîna, gurmitik, feleca zarokan, kuxuk û persîvê digirin. Belgeya xwe ya vakslêdanê, di dema seredana bijîşkî/ê de li gel xwe bibe! Eger we ew belgeya Vakslêdanê nebe, belgeya cihgir, wek di pêveke 2 (rûpelê 19) de ye.

Li Elmaniya hin pêşniyar hene, ka di çi demê de, hinek vakslêdan pêdivî ye bêne wergirtin. Hinek dermanên Vakslêdanê hene, divê çend caran bêne dan, daku kartêkirina xwe bo parastinê bikin. Lew ra pêdivî ye, hun pabend bi soz û civanê xwe bin û bi cedî werbigrin. Hun dikarin agahiyên zêdetir bo van babetan, ji karmendên tendurustiyê yê li cihê mana we dimînin, werbigrin.

Ducanî

Jin ên ducanî, guhpêdaneke tendurustî bi wan bête dan. Birêveçûna ducaniyê û guherînên bi zarokî re çêdibin, divêt di bin çavdêriyê de bin. Pêwîste pişkinînên berdewam û demdestnişankirî (bo nimûne Fehsa xwînê, fehs ên Urin „mîz“ û fehsên bi „Ultraschall“), amadekirin ji bo jidayikbûnê, jidayikbûn û guhpêdan pey jidayikbûnê re jî, bêne kirinê. Eger hun bi ducanî bin, hun ê ji bijîjkên xwe jê peymanger „pasa dayîkê“ (Mutterpass) werbigirin, civanên we yek bi yek bo pişkinînan tê de hebin. Jidayikbûn di rêka Dayîkan û karmendên jidayikkirinê an jî bi rêya bijîşkê/i bi rê ve diçe.

Beriya jidayikbûn û piştî jidayikbûnê jî, dayik û karmendê jidayikkirinê mirovên bo têkiliyê digel wan giring in bo te.

Zarok û ciwanên temenê ta bi 18 salî

Bi şeweyekî giştî, di pey jidayikbûna zarokî re, dêûbav lisernivîsa pişkinînê „deftea fehisan“ bo zarokan werdigirin, ku tê de bi zelalî diyar dibe, di kîjan demê de, çi pişkinînên giring hatine kirinê.

Giring e:

Wê lisernivîsa pişkinînan baş biparêzin û her dema we seredana bijîşkî/ê zarokan kir, di gel xwe binin!

Bo zarok ên ta bi 16 salî, pêdiviyê hinek pişkinînên giring bêne kirinê. Pişkinîna yekem, yekser di pey jidayikbûnê re dibe. Pişkinîna Xama veguertîne, erk ên organên hestiyariyê (bo nimûne, Bihîstin, dîtin), hilim „henas“, xwarintehemulkirin û reh û damar jî têne kirinê. Çavdêriya pêşdeçûn- û guherîn û têkçûnên serederiyan tête kirinê.

Bo ciwan ên ji 12 – 14 salî re, pişkinîneke din têtê pêşniyarkirinê. Di wê rê re, heye diyar bibe, ka asteng û pîrsgirêk di pêşdeçûna ciwan yê gewd „laş“, hoşmendî de, hene an na, bijîşk ji dirêjahî, giranî û zexta xwîna wan fehes dikin û dipîvin.

Ev pişkinîn gelekî giring in, daku bibe alîkar bo pêşdeçûneke tendurust ya zaroka te. Ji ber wê jî hemî civanên xwe bi cidî werbigirin!

Dermankirina diranan

Eger diran gelekî biêşe û nexweşiyek zor di nav dêv de hebe, têtê dermakirinê.

2. Agahiyên praktîk bo parastina ji nexweşiyên vegirtinê

Av û xwarin ji hêla dezgehên fermî ve li Elmaniya têne çavdêrîkirin. Ava ku ji xetê tê malê, asteya wê ya pakîjbûnê bilind û bêtirs mirov dikare vexwe.

Di saziya manê ya yekem û -di kampan de, gelek mirov di cihên teng de, bi hev re dijin. Gelekî bi sûde, eger her yek bi piyala xwe vexwe. Ji ber wê ji betla xwe, an jî piyala xwe nîşan bike. Nexweşî dikarin, di cihê yekem yê manê û -di kampan de bilez berbelav bibin. Çendî hun guhê xwe bidin pak û temîzî xawênîyê, hun ê hew qasî mirov ên din ji nexweşiyên vegirtinê biparêzin. Ji ber wê jî em çend têbînî, rêma û tevdiran bo pak û xawênîyê pêşniyar dikin:

Destşuştina bi hurgilî û berdewam

Destşuştina bi berdewamî tevdirêke baş e bo rê li ber nexweşiyên vegirtinê bigire.

Kengî pêdivî ye destan bişon?

Divêt hun bitaybetî destan bişon:

- piştî her pîskirinekê,
- berya amadekirina xwarinê,
- beriya xwarinê,
- beriya çixarekêşan û vexwarinê,
- piştî her derketineke destavê,
- piştî dest serwanbirina heywanan re,
- piştî kuxuk û pişikandinê di nav dest de,
- piştî difin „bêvil“ pakijkirinê,
- piştî destdana gilêşê.



Li dema destşuştinê, hay ji çi hebim?



Avê berde bila biherrike û destên xwe di bin re ter bike!




Destên xwe bi sabûnê (baştir e sabûna avî be, ji ber sabûna hişk hilgirê mîkroban e) bila gelekî kef bide bişon!



Nav tiliyên xwe û ser tiliyên xwe de, di navbera 20-30 saniyan de bifirkîne û sabûn bike!



Sabûnê têxe bin ava herrikbar û bişo!



Destên xwe bi hayedarî, bi xewliyekê an jî bi klîneksekê zuha bikin!

Kuxik û pişikandin



Di nav destên xwe de, nekuxin û ne jî bipişikin, belê di xweherkirina anîşka xwe an jî di nav destmaleke kaxezi de xwe ji yên din dûr bixin!



Ji bo pakijkirina bêvil, „difnê“ destmalên kaxezi (klînêkis) bikar binin. Lê carekê tenê bikar binin!



Klînêksan li cihê xwe nehêlin û neavêjin erdê. Nexin şalê xwe, bêrika çakêt, an jî çenteyê xwe. Wan nede hev!



Klînêksan bavêjin nav çopê „gilêşê“!



Eger Bêvil-herrickandin „Difin, kepî“ hebe, herdem destên xwe bişon!

Hay ji nişana yekem hebe

Eger we persîv „sermagirtin“ an jî viros di gerde (mîde) de hebe, metirsî heye ku mirov ên din ji we bêne vegirtin. hayedar bin bo parastina xwe û parastina mirov ên bi we re dijîn, eger her nişanek ji wan nexweşiyên diyar bibe: Nişanên encama grîpê diyar dibin gerim û taya ji nişka ve, hestkirina bi nexweşiyê giran, kuxuk û movikêşan. Nişanên virosê gerde, dilxelênka ji nişka ve, verişandin û zikçûn in.

Giring e:

van nişanan bi cidî werbigirin û berê xwe bidin pisporên tendurustiyê li cihê mana xwe!

Pêvek 2: Formulara cihgir bo belgeyên vaksîdanê

Nachname: Geschlecht: Herkunftsland:
 Pêşnav Zayend Welatê te
 Vorname: Geboren am: Unterbringungseinrichtung:
 Pêşnav Dema jidayikbûnê Dema jidayikbûnê Saziyên vehewandinê

Folgende Impfungen wurden durchgeführt: Ev vaksîdanên bihên divê bibin

| Datum Dem | Handelsname und Chargennummer des Impfstoffs (Aufkleber) Navê bazirgani û numereya jekûniya dermanê vaksîdanê (Perçem) | Totimpfungen Vaksîdanên bi mikrobenmîrî „dermanê van vaksîdanên xwar in“ | | | | | | | | | | Lebendimpfungen Vaksîdanên bi mikrobên jîvê | | | | Unterschrift und Stempel der Ärztin/ des Arztes Imze û mohira bijîşkê/i |
|--------------|---|---|---------------------------|--------------------------|-------------------------|----------------------------------|-------------|-----------|--------------------|---------------------------|-----------------|--|--|--|--|---|
| | | Tetanus „Kuzaz“ | Diphtherie „Difteriya“ | Pertussis Kuxka ewayê | Polio Felecâ zarakan | Hib (Hämophilus Influenza b.) | Hepatitis B | Influenza | Masern Gurmitik | Mumps Beyguh, qebeqlaq | Röteln Sorik | Varzellen Xurê avi | | | | |
| | | | | | | | | | | | | | | | | |
| | | | | | | | | | | | | | | | | |
| | | | | | | | | | | | | | | | | |

Vaksîdanên din: Further vaccinations:

| Datum Dem | Impfung gegen Vaksîdan li dijî | Handelsname und Chargennummer Navê Bazirgani û nemra danê | Unterschrift und Stempel der Ärztin/ des Arztes Imze û stempa bijîşkê/i |
|--------------|-----------------------------------|--|---|
| | | | |
| | | | |

Nächster Impftermin (Datum/Impfungen):

Civane bihê yê vaksîdanê (Dem/Vaksîdan)

.....

Ev belavok di çarçwa karê ragehandinê ya wezaretê yekgirtî bo karûbarê tendurustiyê bêpere tête belavkirin. Prtîyên siyasî weke karekî propaganda di hilbijartinan de, an jî wek xamek bo hilbijartinê û bi wê armancê nabe bikar binin. Ev agahî, jî bo hilbijartinê Europa, perlemanê elmanî û yên eyaletan, her wesa jî yên herêm û qezayan ye jî. Karekî keysperestîdar e, bitaybet eger di ahengên hilbijartinan de, li ser mêzeyên agahiyan yên partîyan be, yan li ser belavokên partîyan bo agahiyan siyasî bête wek xameke propegandayê bête perçemkirinê, be. Wê yekê jî himbêz dike, dema bi wateya propeganada bo kesê siyan bête danê. Negirêdayî wê jî, kengî û di çi rêkê de be û hijmaran wan belavokan çend û di çi demê de jî be, nabe bi çi şeweyî wek qezencekê di hilbijartinan de, jê bête têgehiştin û jî hêla partîyên di nav hukumetê de, ku bête, her bo berjewendiyên her grûpekê jî bikaranîn.

Diese Druckschrift wird im Rahmen der Öffentlichkeitsarbeit des Bundesministeriums für Gesundheit kostenlos herausgegeben. Sie darf weder von Parteien noch von Wahlwerbenden oder Wahlhelfern während des Wahlkampfes zum Zwecke der Wahlwerbung verwendet werden. Dies gilt für Europa-, Bundestags-, Landtags- und Kommunalwahlen. Missbräuchlich ist besonders die Verteilung auf Wahlveranstaltungen, an Informationsständen der Parteien sowie das Einlegen, Aufdrucken oder Aufkleben parteipolitischer Informationen oder Werbemittel. Untersagt ist gleichfalls die Weitergabe an Dritte zum Zwecke der Wahlwerbung. Unabhängig davon, wann, auf welchem Weg und in welcher Anzahl diese Schrift dem Empfänger zugegangen ist, darf sie auch ohne zeitlichen Bezug zu einer bevorstehenden Wahl nicht in einer Weise verwendet werden, die als Parteinahme der Bundesregierung zugunsten einzelner politischer Gruppen verstanden werden könnte.